Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî dibêje, "binpêkirina mafên me, dê bibe sedema parçebûn û bêaramiyê."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî li platforma "X" nivîsi: "Ez kêfxwêş im ku bi Cîgira Wezîrê Derve ya Amerîkayê Victoria Nuland re hevdîtin pêk anîye."

Mesrûr Barzanî herwiha got: "Min ji Cîgira Wezîrê Derve ya Amerîkayê Victoria Nuland re rave kir ku divê rêz li destûra Iraqê û

mafên hemû welatiyan ku di nav de yên Herêma Kurdistanê bê girtin."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî tekez kir, "Binpêkirina mafên me wê bibe sedema parçebûn û bêaramiyê."

Ev yek piştî wê tê, Serokwezîr Mesrûr Barzanî iro pêşwazî li Cîgira Wezîrê Derve yê Amerîkayê Victoria Nuland û şanda pê re kiribû.

Di wê civînê de ku Balyoza

Amerîkayê li Iraqê Alina Romanowski amade bûbû, dîtin û nerîn li ser dawî guhertin û pêşveçûnên rewşa Iraqê û deverê û pêşxistina peywendiyê dualî li hev hatin guhertin. Tewereke sereke ya wê civînê girêdayî pêdi-vîtiya çarekirina arêşeyên navbera Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Federalî bû. Her du alî li ser wê yekê hevnerîn bûn ku divê Hikûmeta Federalî rêzê li mafên destûrî yên Herêma Kurdistanê bigire û nabe Bexda wekî welatiyên hejmar du serederiyê bi xelkê Herêma Kurdistanê re bike.

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê tekez li ser giringiya bîhêzkirina sîstema federalî û mukomkirina bingehê demokratî li Iraqê kir.

Cîgira Wezîrê Derve yê Amerîkayê piştevaniya welatê xwe ji bo Herêma Kuristanê û mafên wê yên destûrî di çarçoveya Iraqê de tekez kir. Pêşxistina çanda pêkvejiyanê û azadiya olî û parastina mafên mirov û pêkhatêne Kurdistanê jî tewerekê dî yê danû-standinan bû.

Gelo dê parêzgarê Kerkükê Kurd be?



Ji bo ku parêzgarê Kerkükê Kurd be divê partiyên Kurdan bi partiyên din re tifaqê bikin.

18ê mehê li Iraq û Kerkükê hilbijartinê encûmenê parêzgehan hatin kirin.

Piştî ku encamên hilbijartinê hatin ragihandin çavê her kesî li ser Kerkükê ne.

Piştî sala 2005an cara ewil 18ê Kanûna Pêşînê li Kerkükê hilbijartinê encûmenê parêzgehan hatin kirin.

Encûmena Kerkükê tevî kurşîyê ku kotaya Xiristiyanan e ji 16 kursiyan pêk tê.

Li gorî encaman, kurşîyen Encûmena Parêzgeha Kerkükê wiha belav dibin:

Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK): 5 kursî

Yekîtiya Nişîmanî ya Kurdistanê (YNK): 2 kursî

Eniya Tirkmenî: 2 kursî

Qiyade: 2 kursî

Hevpeymaniya Erebî: 3 kursî

Rube: Kursiyek

Ev encûmen dê parêzgar û serokê encûmenê hilbijêre lê li gorî van encaman partiyek bi tena serê xwe nikare nikare parêzgarê bajêr diyar bike.

Ev jî tê wateya ku ji bo hilbijartina parêzgar û serokê encûmena parêzgehê pêwîstî bi tifaqekê heye.

Encûmena Parêzgariya Kerkükê bi tevahî ji 16 kursiyan pêk tê û partiya ku bigihe 9 kurşîyan dikare ji bo parêzgariyê berbijêrekî destnîşan bike.

Heke partiyên Kurdan bi hinek partiyên din re li hev bikin û bigihe 9 kursiyan dikarin ji bo parêzgariyê namzedekî diyar bikin lê vê carê jî divê partiyên mayî jî vî namzedî bipejirînîn.

Eger partiyên Kurdan li ser namzedê xwe rijd bin û partiyên mayî vî namzedî qebûl nekin dê mijar here Dadgeha Federal a Iraqê.

Partiyên Kurdan nikarin herin dadgehê

Heke ku partiyên Kurdan îti-râzî rewşê bikin nikarin serî li vê dadgehê bidin û bibin dawedar.

Divê partiyên ku postê parêzgariyê bi dest bixin qaymeqamî, serokatiya encûmenê û postên din ên fermî bi partiyên din re parve bikin.

Gelo divê parêzgar endamê encûmena parêzgehê be?

Pewîst nake parêzgarê Kerkükê endamê encûmena parêzgeha be. Divê hemû şertan bi cih bîne û tevîn aliyên encûmenê wî pesend bikin.

Li Iraqê piştî sala 2013an û li Kerkükê jî piştî sala 2005an hilbijartînê encûmenenê parêzgehan hatin kirin.

Kurd li Kerkükê bi 5 lîsteyên cuda besdarî hilbijartinan bûn, YNK 5 û PDK 2 kursî standin.

Niha ji bo destnîşankirina parêzgar pêwîst e ev partiyên Kurdan bigihin hev û bi hinek aliyên din re jî tifaqê bikin da ku karibin parêzgariya Kerkükê bistînîn.

Parêzgariya Kerkükê ji 2005an heta 2017an di destê YNK 6 bû.

Piştî referandûma serxwebûna Başûrê Kurdistanê, hêzên Iraqê ketin Kerkükê û parêzgariya bajêr jî ji destê Kurdan çû.

Niha parêzgariya Kerkükê bi wekaletê di destê Rakan Seîd Cibûrî de ye.

DEM Partiyê ji Leyla Zanayê xwest ku bibe berbijêra Amedê

Hat ragihandin ku dê Partiya Gelan a Wekhevî û Demokrasiyê (DEM Partî) di hilbi-



jartinê herêmî yên 31ê Adara 2024an de ji bo Hevserokatiya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê siyasetmedara Kurd Leyla Zanayê wek berbijêr nîşan dide.

Li gorî agahiyan, DEM Partiyê ji siyasetmedara Kurd a dariçav Leyla Zanayê xwestiye ku bibe berbijêra Amedê.

Herwiha hate ragihandin ku Leyla Zanayê heta niha ti bersiveke erêniyan neyînî nedayê.

Li gorî zanyariyên Rûdawê, Leyla Zana dê di demeke kurt de biryara xwe bide.

Hate diyarkirin ku rêveberên DEM Partiyê dê di rojên pêş de careke din bi Leyla Zanayê re bicivin.

Efrîn: Çekdarê Emşatê 3 Kurd girtin

Çekdarê grûpa Silêman Şahê ya ku wekî "Emşat"ê tê naskirin û ser bi Tirkîyeyê ve ye 3 Kurd girtin. Çekdarê grûpa Silêman



Şahê ya ku wekî "Emşat"ê tê naskirin û ser bi Tirkîyeyê ve ye 3 Kurd girtin.

Emşatê ev her sê kes li gundê Hêkecê yê navçeya Şiyê ya Efrînê bi hinceta "pêwendiya bi Rêveberiya Xweser re" girtin.

Rewangeha Sûriyeyê ya Mafên Mirovan (SOHR) da zanîn piştî ku ev kes ji Helebê vegeriyane ser mal û milkên xwe hatine girtin.

Çekdarê di kontrola Tirkîyeyê de 11ê vê mehê jî li bajarê Cerablusê yê bakurê Helebê Kurdeki ji gundê Kehnî Korkê yê Efrînê girtibû ku dixwest vegere warê xwe.

Çekdaran ji bo berdana wî ji xizmîn wî 5 hezar dolar xwestibûn û çarenivîsa wî heta niha jî ne diyar e.

Dagirkirina Efrînê

Artêşa Tirkîyeyê û grûpê çekdarê ên di kontrola wê de, 20ê Kanûna Paşîna 2018an ji asîman û bejahiyê ve bi awayekî berfireh êrişî Efrînê kir ku wê demê di destê Kurdan de bû.

Piştî wê êrişâ berfireh a bi her cor çekêngiran, bajarê Efrînê 18ê Adara 2018an ket destê artêşa Tirkîyeyê û grûpê çekdar.

Di encama êrişen giran û dagirkirinê de bi sed hezaran Kurd ji mal û milkên xwe bûn û ketin ser rûyên koçberiyê.

Ji roja ku Efrîn ketiye bin dagirkirina Tirkîyeyê ve girtin, revandin û kuştina Kurdan berdewam dike.

Metirsîya nebûna projeyekî Kurdî



Ebâdulazîz Qasim

Niha wek dibînin li vî serdemî, bi gelempêrî ku her çarçoveyek netewî, siyasî, aborî, rewşenbîrî li ser rûyê vê cîhanê, projeyek yan planek taybet bi rîkûpêk heye, yan pitir ji projeyekî ji bo pêkanîna armanc û berjewendîyên xwe yên taybet û rêveçûna digel karwanê pêşkeftinê û bidestxistina hokarên bîhêzbûnê û berdewamîyê, herwiha rûbirûbûna her metirsîyeke siyasî, aborî, ewlekari û rewşenbîrî, yan jî rûbirûbûna projeyen aliyên dijber û neyar, ji ber vê çendê ku her projeyekî serkeftî pêdivî bi rîkar û alavên hêz û sengiyê heye, ku ev yek jî li ser bingeh û binyatên bîhêz û qahîm ava dibin.

Demê ku em vê xwendinê bi rewşa giştî ya siyasî û rewşenbîrî ya Rojavayê Kurdistan re didin ber hev û berawerîdikin, tevlî rewşa parçebûn û bêtifaqîya siyasî, hevdem ku li ber çavan ti projeyekî Kurdi xuya nabe û nayê dîtin, herwiha ku ti xebatek rasteqîn ji bo bidestxistina mafêñ gelê Kurd li Sûriyê jî nabe, zêdebarî ku aliyên dî li ser qada Sûriyê projeyen xwe yên taybet

hene û hindek ji wan aliyan projeyen dijberî maf û hebûna gelê kurd hene, bi taybetî projeyen erebkirinê yên rîjîma Sûriyê û hevalbendê wê û projeyen dagîrkariya Tirkîyê û opozîsyona Sûri ya alîgirê wê.

Helbet nebûna projeyekî Kurdî, metirsîyen mezîn li ser hebûn û siberoja miletê Kurdi çê dike, netenê hîc projeyek Kurdî nîne, hevdem ku bi destên Kurdan xwe bi xwe pirsa neteweyî ji naveroka wê ya neteweyî tê berovajîkirin, tevî ku beşek mezîn ji partiyen kurdan bi aşkera xwedî li pirsa neteweyî der-nakevin û xwe wekî hêzên Sûri ya bi tenê dîmokrat dibînin, ku bi awayekî dikarin bêjin ev rîexistinê wiha bûne bargiraniyek li ser gelê kurd, bi awayekî ku nebûna siyaseteke neteweyî ya kurdî dikeve di berjewendiya rîjîma Sûriyê û dagîkeren Kurdistanê de û projeyen wan yên ji bo tinekirina miletê kurd û pûçkirina pirsa netewî!.

Ji destpêka sala 2011an ve û heta niha hîc pêkhatîyeke netewî li Sûriyê, wekî kurdan tûşî zererê nebûne, ku pitir ji nîvekî miletê kurd koçber bûye û nîveka axa Rojavayê Kurdistanê hatîye dagîkerin ji aliyê Tirkîyê û çeteyen wê yên terorîst ve, tevî wisa jî hêj aliyên kurdî negîhiştine hîc rîkeftinekî ji bo parastina nîvî mayî ji miletê kurd û nîvî mayî ji axa Kurdistanê.

Tevî girîngiya zêde ya yekrêziya Kurdi, niha û sibe û heta sed salê dî, dubare û sêbare divê em bi gotin û bi kiryar pêdagirê li ser yekrêziya Kurdi bikin ku ji her tiştekî dî girîngir e, û kîlîta serkeftîne ye, nemaze ku projeyen Tirkîyê û İranê li Sûriyê li ser tinekirina pirsa neteweyî ya kurdî

û bêtifaqîya kurdan ava dibin, lewra pêdiviyeke dîrokî bo hebûna projeyekî Kurdi heye, da rî li hember projeyen dagîkeren bigire, ku iro ji her demekî dî zêdetir pêdiviya pirsa Kurdi bi hebûna projeyekî Kurdi yê neteweyî heye, her wekî em dizanin ku heryek ji Tirkîyê û İranê bi hemahengî digel Rûsiyâ kar dikin di serî de ji bo tinekirina gelê kurd û paşî bo dersînorkirina hêzên Amerîkayê ji Sûriyê, lê niha piştî şerê Xezayê, roj bi roj wisa diyar dibe ku rewşa Sûriyê û navçeyê jî dê bîhete guhortin, dê rola İran û Tirkîyê li nêv qada Sûriyê lawaz bibe, ku dîsa derfetên baş dê peyda bibin ji bo bidestxistina mafêñ neteweyî yên gelê kurd li Sûriyê, lê herger rewşa tevgera siyasî wisa bîmîne û kar nebe ji bo yekrêziyeke neteweyî û ji bo yekxistina nîrîn û gotateke siyasî ya hevbeş û yekgirtî, bê goman wê demê dê dîsa derfetên di siberojê de bêne pêş, dê çarenivîsa wan wekî çarenivîsa heman derfetên berê be, ku wê bêhûde li ber bayê biçin, lewra wek tê dîtin bi taybetî li van dûzde salê dawiyê yên qeyrana Sûriyê, ku aliyên Siyasî û Hizbî yên Rojavayê Kurdistanê bi siyaset û boçûnên xwe yên niha nikarin hêmanê hêzê û yekrêziye peyda bikin û nikarin xwedî li projeyekî netewî kurdî derkevin, heta ku derfet û delîve jî ji bo vê yekê bêne pêş û bibin alîkar û hevdem bo mafêñ gelê kurd jî, her wekî Melayê Cizîrî di helbesteke xwe de dibêje:

((Her gil û seng dibilitin zêr bi tedbîrî hekîm

Qabilîyet ku nebit hikimî Ostad ci kit?)).

Serokerkanê Wezareta Pêşmerge pesne hêzên hevpeymaniya navdewletî ya li Herêma Kurdistanê da û ragihand, welatên hevpeymanan û di nav wan de İtalya, di şerê DAIŞê de hevkariya Herêma Kurdistanê û Hêzên Pêşmerge kîrin. Herwiha got ku qonaxa niha ya Hêzên Pêşmerge pêwîstî bi alîkariya zêdetir ji dostêni di Hevpeymaniya Navdewletî de heye, ji bo avakirina jêrxaneya leşkerî ya bihêz û avakirina hêzeke niştimanî ya yekgirtî.

Fermandarê Giştî yê NATOyê General Nicola Piacente amaje bi wê kir, ew wek beşek Hevpeymaniya Navdewletî, pabend dibin bi karkirina ligel hevparêن xwe yên li herêmê. Tekez kir jî, hêzên wan dê di warê rahênanan de, li ser dana şêwirê bo hêzên Pêşmergeyên Kurdistanê berdewam dibin.

Konsulê Giştî yê İtalyayê li Herêma Kurdistanê jî behsa girîngiya pêwendiyen di navbera welatê xwe û Herêma Kurdistanê de kir û daxwaza berfirehtir û pêşxistina pêwendiyen li gel Wezareta Pêşmerge û Hikûmeta Herêma Kurdistanê kir.

PWKê li Amed û Mêrdînê Roja Ala'ya Kurdistanê pîrozkir

Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) li Mêrdînê û Amedê li kolanan Roja Alaya Kurdistanê



tanê pîroz kir, û Alaya Kurdistanê dîyarîyî gel kir.

Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) roja 17.12.2023yê li Qada Azadîyê ya Navçeya Qoser a Mêrdînê û li Fûara Pirtûkan a Amedê Roja Alaya Kurdistanê pîroz kir. Her wiha hat ragihandin ku Alayê Kurdistanê di nav gel de hatiye belav krin.

Li Qoserê Li Qada Azadîyê Ji Bo Roja Alaya Kurdistanê Pîrozbahîya PWKyê

Endamên Teşkilata Mêrdînê ya PWKyê, roja 17.12.2023yê li Qada Azadîyê ya Qoserê bi Alayê Kurdistanê kom bûn. Cîhgirê Serokê Giştî yê PWKyê Bedran Acar daxuyanîya PWKyê ya di derbarê Roja Alaya Kurdistanê de xwend. PWKê di daxuyanîya xwe ya ku di tevna civakî de weşandiye da zanîn ku Qoserê pêşwazîyeke germ li vê çalakîya PWKyê kirine û piştigîr dane çalakîyê.

Berdevamiya daxuyanîye de tê gotin ku; Gelek ciwanên Kurd piştî çalakîyê hatin avahîya Teşkilata Mêrdînê ya PWKyê, memnûnîyetê xwe anîn zimên û daxwaza Alaya Kurdistanê kîrin.

Li Fûara Pirtûkan ya Amedê Ji Bo Roja Alaya Kurdistanê Pîrozbahî

Her wiha hat eşkerekirin ku roja 17.12.2023yê, li Fûara Pirtûkan ya Amedê Alayê Kurdistanê li gelê me û li weşanxaneyen ku beşdarî fûarê bûbûn kîr. Tê pêşbinî kîrin ku gelê Amedê û weşanxaneyen bi germî pêşwazîya vê çalakîya PWKyê û Alayê Kurdistanê kîrine.

Dawîya gotinê de; "PWKyê Fûara Pirtûkan a Amedê bi Alayê Kurdistanê xemiland. Piştî vê çalakîya PWKyê, polîsîn Emnîyeta Diyarbekirê xwestin Alayê Kurdistanê yênku PWKyê dîyarîyî gel kîribûn berhev bikin, lê bi serneketin."

DNO rîjeya berhemanîna petrola Kurdistanê zêde dike

Kompaniya DNOyê ya Norwêci berhemanîna petrolê li Herêma Kurdistanê zêde kîriye û di pilana



wê de ye bîreka dî jî ya petrolê li Herêma Kurdistanê bikole. Iro (Sêsem, 18ê Berçileyê 2023ê) Birêveberê Bicihanînê yê Kompaniya DNOyê ya Petrolê ya Norwêci Bîjen Rehmanî di ragehandinekê e eşkere kir, rîjeya berhemanîna petrolê li zeviya petrolê ya Tawkê ya Herêma Kurdistanê zêde kîriye û berdewam jî di zêdebûn de ye, bi rengekî ku niha nîz 90 hezar bermîlen petrolê tên berhemanîn.

Birêveberê Bicihanînê yê Kompaniya DNOyê amaje da wê yekê jî ku, di wê bawerê de ne ku ew qebxwaziyên rûbirûyî kompaniya wan û kompaniyen din jî bûne dê bîn çarekîrin û "li ser berfirehkîrîna karê xwe yê bazîrganî li Herêma Kurdistanê pabend in".

Wekî ku di ragehandina Birêveberê Bicihanînê yê Kompaniya DNOyê de hatîye, di pilana wan de ye li sala 2024ê li Başîkê bîreka dî ya petrolê bikolin.

Kompaniya DNOyê ya Norwêci li çend zeviyen petrolê yên Herêma Kurdistanê kar dike, wekî zeviya Tawkê û zeviya Pêşxabûrê.

Fermandarê Hêzên NATOyê li Iraqê: Em bi rahênakirina Hêzên Pêşmerge berdewam dibin



Fermandarê Giştî yê Hêzên NATO li Iraqê ragihand, ew li ser rahênakirina hêzên Pêşmergeyên Kurdistanê berdewam dibin. Serokerkanê Wezareta Pêşmerge ragihand, avakirina jêrxaneke leşkerî ya bihêz û avakirina hêzeke niştimanî ya yekgirtî li Herêma Kurdistanê, garantiya serkeftin û pêşketina Herêma Kurdistanê di paşerojê de ye.

Wezareta Pêşmerge iro 19ê Berçile di daxuyaniyekê de ragihand, Fermandarê Giştî yê Hêzên

Ez û Têkoşer û Helbestvan Mûsa Zaxuranî (Bavê Gulê)




Di vê jiyanê de, mirov pêrgî gelek kesan dibe.. Hevaltî û dostaniyê bi hina re datîne.. Hezkirina hina ji wan dikeve dilê wî de û her ku dem bi pêş de dire, ew hezkirin mezin dibe.. (Mûsa Zaxuranî: 1955-2023), yek ji wan hogir û dostên min yên hezkirî bû..

Di roja 15.7.1991ê, bîranîna 40 saliya koçkirina Mîr Celadet Bedirxan de, ya ku min û çend hevalan li Qamişlo vejand, me hev nas kir.. Ji wê hingê ve ez û wî bibûn hogirên hev.. Her roj me hev didit.. Em li dor gelek babetên kurdewariyê disekinîn.. Bi wateyeke din; Em bibûn destbirakê hev.. Me ji hev fam dikir..

Mixabin, ji ber vê toşa ku li Sûriyê û Rojava rûdaye, wî jî wek gelek kesan, ji berî çend salan ve Qamişlo li paş xwe hiştibû û di Hewlêr û Duhokê re derketbû. Sed mixabin ku ew iro 19.12.2023ê li Hewlêr bi egera nexweşiyê di temenê 68 salî de canê xwe ji dest da û çû ber dilovaniya Xwedê. Xwedê wî bi dilovaniya xwe şad bike.

Ew sala 1955an de li gundê Letîfiyê hatibû vê dinyê, di malbateke kurdperwer de mezin



**Helbestvan:
Mûsa Zaxuranî**

bûbû...Di sala 1968an ve dest bi karê siyasi û nivîsandinê kîribû.. Di sala 1973an de bekeleriya stand û bû mamoste di dibistanê Erebî yê Cizîrê de.. Digel mijûliya wî bi siyasetê, nivîsandina helbestan û gotarêñ rewşenbîrî hebû û dînîvîsandin.. Berhemên wî di gelek rojname û kovarêñ kurdî de hatine bilav kîrin wek: Metîn – Sitêr – Gelawêj – Gurzek Gul – Zanîn – Peyman – Rojhîlat – Peyv – Xebat – Teaxî – Roj... hd.). Ü di tev festîvalên helbesta Kurdî de besdar dibû..

Herweha ew yek ji endamên

Yekîtiya Nivîskarêñ Kurdistanâ Sûriyê bû, hem jî endamê komîta Mehrecana Helbesta Kurdî li Sûriyê/ 2007 bû, hem jî yê Koçka Qamişlo ya Çand Kurdî bû.

Dawî, bi min xweş e bêjim, ku min ew wek têkoşerekî siyasi û helbestvanekî çeleng ku bi kul û derdêñ gelê xwe ve girêdayî bas kir û wek ku kurdan gotiye: Ga dimre çerim dimîne, mîr dimre nav dimîne.

Ji berhemên wî yên çapkirî ev in:

- 1 – Govendek Helbest, helbest/ 2009.
- 2 – Bûka Helbestan, helbest/ 2022.
- 3 – Landika Helbestan, helbest/ 2023.

17-23 Çileya pêş, dekabr, sal 2023

Leşkeran êrişî cotkaran kir: 'Ev Kurd in li wan bixin!'

Leşkerêñ Îraqê li Gundê Topzawayê yê Kerkükê êrişî cotkaran Kurd kir.



Li gorî gotinêñ gundiyan, leşkeran gotiye, "Ev Kurd in li wan bixin" û êrişî xelkê gund kiriye. Artêşa Îraqê dixwaze di nav zeviyêñ Kurdan ên bitapo de rîyeke nû çêbike.

Gundiyan rî neda ku rî di nav erdêñ wan re derbas bibe û rîya leşkeran girt.

Wekî ku di destpêka dîmenan de jî xuya dike, nêzîkî 100 leşkerî li Topzawayê bi ser çend malêñ Kurdan de girt.

Leşker êrişî gundiyan kir û bi dar û qundaxêñ tivingan li wan xist.

"Ev Kurd in li wan bixin"

Berzan Nazimê ku şenîyekî Topzawayê ye got: "Leşkeran gundi civandin û wan ji xelkê re got, 'Otomobîlên xwe bidin alî çîmkî dê mekîneyêñ kar rî vequin.'

Derdora 100 leşkerî hebûn, fermanderekî wan digot, 'Ev Kurd in li wan bixin.'

Tevêñ leşkeran êrişî me kir û wan bi dar û tivingan li me da. Çekêñ wan hebûn, em li hewşen xwe bûn û me tiştek nekiribû."

Zeviyêñ ku artêşa Îraqê dixwaze li ser wan rîyeke çêbike zêviyêñ Kurdekkî bi navê Nazim Mehmûd in.

Ji ber ku ew vê biryarê qebûl nake leşkerêñ Îraqê beriya niha bi çend rojan ew desteser kîribû, paşê bi kefaletet hatibû berdan.

Gundiñ dibêjin armanca leşkeran ew e ku dest deynin ser tevêñ zeviyêñ van.

Nazim Mehmûdê ku xwediyyê zeviyê ye wiha axivî: "Hema ez û zarokêñ xwe hatin, ew li vê derê bûn. Em diaxivîn, wan jî agir dikir.

Ji nişka ve 100 leşker hatin, em dan ber dehfan. Wan bi awayekî dijwar êrişî me kir û li me xist."

"Pêdîvî bi rîyeke din nîne"

Gundiñ, pişîfî van bûyeran bi fermandarê leşkerî re civiyan û çêkirina rîye hat taloqkirin. Nûnerê Topzawayê Satîh Nasîh, "Wan ji me xwest em ji bo rîye cihekî alternativ peyda bikin. Me ji go ku jîxwe sisê rîye baregeha leşkerî hene û pêdîvî bi rîyeke din nîne."

Wan xebat bi awayekî demkî rawestandin lê dî dîsa dest pê bikin." Artêşa Îraqê dixwaze di nava 3 salan de li gundêñ Topzawa, Yayçî û Terkelanê li ser zeviyêñ Kurdan 3 avahiyêñ leşkerî û 380 avahiyêñ din lê bike.

PWK: Em Qetîlama Meraşê(Girgumê) Rûres Dikin

"45 sal berê, sal 1978, di navbera rojêñ 19 û 25ê çileya pêşîn de, li bajarê Girgumê(Meraşê), li




Bakurê Kurdistanê qetîlamet li dijî xuşk û birayêñ me yên Kurdêñ Elewî hate kîrin.

Ev qetîlama ji alîyê hêzîn veşartî û yên aşkere yên nîjadperest û faşîst ên Dewleta Tirkîyê ve hatibû organîzekerin û li darxistin.

Di vê qetîlamê de 111 Kurdêñ Elewî hatin kuştin, 1500 kes jî birîndar bûn. Di 45emîn salvegera Qetîlama Meraşê de, em vê qetîlamê û quesasên wê rûres dikin. Em hemû qurbanîyêñ vê qetîlamê bi giramî bibîr tînin."

Dr. Viyan Silêman: Zêdetir ji 100 hezar jinan sûd ji çalakiyêñ Yekîtiya Jinan wergirtine



nava 5 salan de ji sala 2018 heta 2023an, me bi hemû hêza xwe hewl da ku Yekîtiya Jinan Kurdistanê bipêş bixin. Di warê karînê mirovî de jî me kar kir ku kadroyêñ me di asta herî baş de xizmeta armancêñ rîxistinê bikin."

Li gorî Dr. Viyan, wan hewl daye ku pirsgirêka jinan bibe mijareke giştî, di vê çarçoveyê de, 100 hezar

Sekretera Giştî ya Yekîtiya Jinan Kurdistanê di 9. Kongreya Yekîtiya Jinan Kurdistanê de gotarek pêşkêş kir û got: "Yekîtiya Jinan rîxistinê e, cihê baweriya jinêñ Kurdistanê bi hemû pêkhateyêñ wê yên olî û etnîkî ye." Sekretera Giştî ya Yekîtiya Jinan Kurdistanê Dr. Viyan Silêman di gotara xwe de got: "Pişîfî lidarxistina Kongreya heştemîn, di

Diyar kir jî, di vê heyamê de jî, projeya şewirmendiya berî zewacê bi hevahengîya li gel tenduristîyê hatine pêşkêşkirin. Projeya piştevaniya tenduristîyê ji bo zarok û jînêñ malbatêñ kêmderamet, bi besdariya 200 pizîşkîn xwebexş di projeyan de û pêşkêşkirina çareserîyê ji 370 nexweşan re hatine kîrin.

Dr. Viyan diyar kir jî: "1388

alîkîriyê civakî ji bo jînêñ malbatêñ kêmderamet, herwiha cîbîcîkirina projeyan bo bazarkirina berhemên destî yên jinan û peydakirina derfetêñ kar bo jinan, hatine kîrin."

Tekez kir jî, kongre di demekê de tê lidarxistin, Yekîtiya Jinan amadekariya qonaxeke din a têkoşîna wekhevî û neteweyî dike, ku rewşa herêmê û Kurdistanê di demeke diyarker re derbas dibe.

MSDê hevserokên nû hilbijartin

Meclîsa Sûriyeya Demokratîk (MSD) di dawîya kongreya xwe ya çaremîn de, Leyla Qereman û Mehmûd El-Mislet wek hevserokên nû hilbijartin.



MSD ê iro 20.12.2023an kongreya xwe ya çaremîn li bajarê Reqayê lidar xist û tê de reşnivîsa belgeya siyasî ya MSD'ê erê kir û Leyla Qereman û Mehmûd El-Mislet wek hevserokên nû li şûna Emîne Omer û Riyad Dirar hilbijartin.

MSD baskê siyasî yê Hêzîn Sûriyeya Demokratîk (HSD) ye. Erkê wê yê diyarkirî, pêkanîna "sîstema sekuler, demokratîk û nenavendî li hemû Sûriyeyê ye".

Civata Wezîran danûstandinan li ser biryara wergirên müçeyên şehîd û enfalkiriyan dike

Civata Wezîrîn Herêma Kurdistanê dicive û tewerekî serekî yê wê civînê dê danûstandinê li ser biryara wergirên



müçeyên şehîd û enfalkiriyan be.

Fermangeha Medya û Zanyaran ragehand, ê iro (Çarşem, 20ê Berçileya 2023ê) Civata Wezîrîn Herêma Kurdistanê, bi serperiştiya Serokê Civata Wezîrîn Mesrûr Barzanî û amadebûna Cîgirê Serokê Civata Wezîrîn Qubad Talebanî, dicive.

Pareka wê civînê dê berçavkirin û xwandinâ yekê ya made û bendên reşnivîsa yekê ya rênimayê karkirina biyaniyan li Herêma Kurdistanê be.

Pareka dî dê girêdayî bicihanîna biryara berê ya Civata Wezîrîn li ser wergirên müçeyên şehîd û enfalkiriyan be.

Topek li navenda gundekî Amêdiyê ket

Topek li navenda gundê Guherzeyê yê ser bi nahiya Dêrelûkê ya navçeya Amêdiyê



ya parêzgeha Dihokê ket. Li gorî agahiyê heremê, ti zererên canî çênebûne. Welatiyê wî gundî Isa Guherzî ji Rûdawê re got, ew guleya topê li navenda gundê Guherzî ketiye lê ti ziyanê canî çênebûne û tenê zerer gîhîştiye çend malan. Bi gotina Isa Guherzî, ew nizanîn ew guleya topê ji kû derê ve hatiye lê xelkê gund ditirse.

Di nava 3 mehan de ev cara pêncemîn e ku top li gundê Amêdiyê dikevin.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî: Me soza xwe bi cih anî

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê di derheqa hinardikirina sêvîn Berwarî Bala yên Herêma Kurdistanê bo derveyî welatî de ragehand, "Me soza xwe bi cih anî".

Roja borî (Pêncsem, 21ê Berçileya 2023ê) Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî li ser tora civakî ya "X"ê vîdyoya amadekirin û hinardikrina sêvîn Berwarî Bala yên Herêma Kurdistanê bo Qeterê û welatîn din ên kendavî parve kiriye û nivîsiye, "Me soza xwe bi cih anî".

Hikûmeta Herêma Kurdistanê parve kiriye ku, ji bo cara yekê sêvîn Berwarî Bala yên Herêma Kurdistanê hinardeyî Qeterê û welatîn dî yên kendavî tên kirin û pabendiya xwe jî li ser pirrengkîna aborî û peydakirina bazarên nû ji bo berhemîn xwemalî tekez kiriye.

Di berdewamiya bizavê



kabîneya nehê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê de ji bo piştevaniya cotyarên Herêma Kurdistanê û berbazarkirina berhemîn wan û hinardikirina wan ji bo sûkên cîhanî, piştî hinardikirina hinar, hingivîn, pitat û çend berhemîn din ên xwemalî, sêvîn Herêma Kurdistanê jî hinardeyî derive tên kirin.

Roja Çarşemê, 20ê Berçileya 2023ê, Wezîra Çandinê û Çavkaniyê Avê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê Bêgerd Talebanî di konfiranske rojnamevanî de ragehand, karwanê yekê yê sêvîn Berwaî Bala ya Herêma Kurdistanê ku ji pênc tonan pêk tê hinardeyî Qeterê hat kirin û ev pirose dê berdewam be.

Çandar: Ji sedî 60ê civakê daxwaza çareseriya pirsa Kurd dike

Parlamentevê Partiya DEMê Cengîz Çandar diyar kir ku ji sedî 60 ê Tirkîyê alîgirê çareseriya pirsa Kurd û bicîhanîna daxwazê zimanê zikmakî ye û got: "Xuyaye ku di civakê de guhertina feraseta Kurdan û nêzîkiya li ser Kurdî bi polîtikaya siyasî re li hev nayê".

Parlamentevê Partiya Wekhevîya Gelan û Demokrasiyê (DEM) têkildarî bûdceya Serokatî û rêt-istinê girêdayî wê, ku di Civata Giştî ya Meclîsê de hatin nîqaşkirin, mafê axaftinê stendin. Parlamentevê Amedê yê Partiya DEMê Cengîz Çandar bi Kurdî axivî. Çandar xwest ku Kurdî xizmeta têkiliyên Kurd û Tirkan bike. Gotinê Çandar ên Kurdî di protokolê de wek zimanê nenas û ..." û "(*)" hatin qeydkirin.

Min dest bi dersên Kurdi kir

Çandar bertek nîşanî nêzîkiya Meclîsê ya ji bo Kurdî û zimanê din ên zikmakî da. Çandar, anî zimênu ku piştî 65 saliya



xwe dest bi dersên Kurdi kiriye û got: "Tenê sedemek hebû ku min hewl da fêrî Kurdi bibim. Min ev salek berê di TRTê de rave kiribû. Ji ber rêzgirtinê divê em ji welatiyê xwe yên Kurd re, ku em wan wek çaryeka welatê xwe û parçeyekî bingehîn ê gelê xwe dibînin, nîşan bidin".

Daxwaz ji sedî 60 e

Çandar bal kişand ser encamên komxebat û lêkolînê li ser çareseriya pirsa Kurd û zimanê zikmakî

û diyar kir ku ji sedî 60 ê Tirkîyê alîgirê çareseriya pirsa Kurd û bicîhanîna daxwazê zimanê zikmakî ye. Çandar got: "Lê belê qada siyasî ne bi vî rengî ye. Xuya ye ku di civakê de guhertina feraseta Kurdan û nêzîkbûna zimanê Kurdi bi qada siyasî re li hev nayê. "Siyaset dema dersên xwe ji vir bigire û dest bi xebata li ser 'emê çawa behsa vê sosyolojiya ku diguhere' bikin wê bersivan bibîne."

PDK li Mexmûrê bû partiya yekem

Di hilbijartinê encumenên navçeya Mexmûrê de, Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) piraniya dengan bidest xist.

Herwiha Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê (YNK) jî li Mexmûrê bû duym.

Nûçegihana ajansa Rûdawê got, "Li navenda Mexmûrê 5 navendêng dengdanê hebûn.

Li gorî encamên destpêkê yên ne fermî Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) 2 hezar û 101 deng bi dest xistîye.

Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê (YNK) jî 915 deng bi dest xistîn.

Li bajarê Kerecê PDKyê 2 hezar û 100 deng û YNKyê jî 280 deng bidest xistîn."

Berpîsê Rêxistina Mexmûrê ya PDKyê Kirekar Şakir vê serkeftinê bi alîgirên partiyê re pîroz kir.

Kirekar Şakir spasiya xelkê



herêmê kir.

"Kurdan nîşan da ku Mexmûr Kurd e û girêdayî Hewlîrê ye."

Şakir anî ziman ku wan serkeftineke mezîn bi dest xistîne û wiha pê de çû,


PDK di hemû hilbijartinê Mexmûrê de bê rikaber e. Em spasiya birayê xwe yên Ereb jî dîkin ku li Kerecê deng dane me.

Me ji bo birayê xwe yên Ereb

en Mexmûr jî xizmet kir. Kurdan nîşan da ku Mexmûr Kurd e û girêdayî Hewlîrê ye.

Rêvebera Rêxistina 23yan a PDKyê Nerîman Mele Ezîz jî diyar kir ku li Mexmûr, Kerec û Gwêrê dengdan bi awayekî herî azad û demokratîk derbas bû.

Nerîman Mele Ezîz ji ajansa Rûdawê re axîvî û got, "Piştgiriya birayê Ereb pir girîng e."



Evdille Ibrahim Şemoyi

GEVİZANDİN

Çerx û felek çep zivirî.
Pirzan kirine deng birî.
Nezana bask veda firî.
Se yê gurî,şêr gevizand.

Nirxê toraq,hingif bû yek.
Newêreka hildan zirx çek.
Kê pere dît,xwe kir şêrek.
Qey bû wêrek,şêr gevizand.

Li ku ma textê edalet.
Wekê şah jî bû bê xîret.
Dane lî rovî da hurmet.
Wî kir qelet,şêr gevizand.

Nemaye dostî,biratî.
Hesibandin yê der hatî.
Welat kirine şest partî.
Gurê kotî,şêr gevizand.

Ez ci bêjim dewr bû xerab.
Dunya hemu bû dek dolab.
Ker kirine bi zêdenab.
Wî bê etab,şêr gevizand.

Şeref û namûs jî nema.
Hundurê min xar kul xema.
Çi dersê bidim bê fema.
Keftar lewma,şêr gevizand.



Dilan Maku

Bi dil dicim işev

Ne xeyîdîme ji kesî ,
Xwê re nabim ci kirasî ,
Napiçim dil ci arisî ,
Bi dilê xwê dicim işev ,

Nabêje tu li ku yî

Vê cîhana derewîn ,
Bajêrê mat û sêwîn,

Her bênobê bi dil dixim,
Kîjan xatiratê te raxim,
Êşa xwê li vî arî barkim ,
Bi dilê xwê dicim işev ,

Bi dengê kê ,te birbinim,
Sewta şakro dil bexşînim,
Her hevokê de te dibînim,
Bi dilê xwê dicim işev ,

Ez û rîya xwe bi işev ,
Binax bikim bikijan Şev,
Hemû birîndarin bi tev,
Bi dilê xwê dicim işev ,

Dibarî rûyê min fêrmesk,
Min hilgirt ji bo te kir misk,
Rêkim bo te dil neke çîsk,
Bi dilê xwê dicim işev ,

Ji hevre êş û birîn ,
Nebêje tû li ku yî ,

Azad nînim li vira,
Dibecim ber dîwara ,
Ax dikim kul derda ra,
Nebêje tu li ku yî ,

Xerabeye ev dever,
Ne sitare ne sîber ,
Qerîsîme û xwlîser,
Nebêje tu li ku yî ,

Winda bûme li çola,
Dixûnim wek bilbila,
Li ser dara û gula,
Nebêje tu li ku yî ,

Koçberim û bê warim,
Mirov hezim bê parim,
Cîhanê de penaberim,
Nebêje tu li ku yî ,

Lêkolîn: Li Tirkîyeyê Kurd çîqasî xwedî li nasnameya xwe

Li gorî rapora Navenda Lêkolînen Kurdish, ji sedî 67,4ê Kurdên Bakurê Kûrdistanê bi awayekî bîhêz li nasnameya xwe xwedî derdi Kevin. Navenda Lêkolînen Kurdish bi sernavê "Pirsgirêka Kurd û Bîrbiriya li Ser Kurdish" raporeke taybet amade kir.

Rapora nû ya Navenda Lêkolînen Kurdish destnîşan kir ku nîvê Kurdish xwe di asteke bilind de "Kurd" dibînin.

Rapor bi hevkariya Enstîtuya Lêkolînen ya CORE, Rawest Research, The European Endowment for Democracy (Weqfa Demokrasiyê ya Ewropayê) û Weqfa Heinrich Bollé hatiye amadekirin.

Rapor ji çar lêkolînen cuda hatiye berhevkinir.

Lêkolîn bi sernavê "Nasname, Hest û Pratîkên Cudakariyê, Zimanê Zikmakî, Pirsgirêken Kurdish û Daxwaz, Pirsgirêka Kurdish û 100 Salê Komarê, Nirxandinê Pêşengê Civakê, Kurdish û Çanda Popûuer, Bîrbiriya Tirkan a li Ser Kurdish, Pirsgirêka Kurdish û Pêvajoya Çareseriyê, Daxwazê Kurdistan, Nêzîkatiyen Wan û Daneyêne Lêkolînen Çi

Dibêjin?" hat parvekirin.
Nasname

Di beşa lêkolînen ya bi sernavê "Nasnameyê" de tê gotin ku "Kurd xwe wekî oldarêن Misilman û azadîxwaz pênase dikan. Bi vê re nasnameyeke azadîxwaz û oldar derdi keve pêş." Nasnameya Kurd êdî li Tirkîyeyê bi dengekî bilind û zelal tê ifadekirin û hilgirtin.

Zêdetirî Kurdish angò ji sedî 53yê wan xwe "di asteke bilind de Kurdish" dibînin.

Ji sedî 14ê wan xwe "di asteke kêm de Kurdish" dibînin û ji sedî 13ê wan jî "serbilindiya bi Kurdbûnê" qebûl nakin.

Ev meyl li gorî temen, zayend, perwerdehî û li gorî asta dahatê naguhere.

Li gorî endeksa xwedîderketina li nasnameya Kurdish, serbilindiya bi Kurdbûnê, asta Kurdbûna û helwêstên li hemberî perwerdeya bi zimanê zikmakî pêk tê, ji sedî 67,4ê Kurdish bi awayekî bîhêz xwedî li nasnameya xwe derdi Kevin.

Hest û Pratîkên Cudakariyê

Li gorî lêkolînen, ji sedî 60ê Kurdish difikirin ku ew ji ber nasnameya xwe ya Kurdish

rûbirûyî cudakariyê dibin.
Nîvê kesen ku dibêjin em rûbirûyî cudakariyê têxwe aîdê Tirkîyeyê nabînin.

Her ku nasnameya Kurdish bi hêz dibe ev rîje jî zêde dibe.

Li gorî vê, ji sedî 29ê Kûrdêñ nasnameya wan lawaz e û ji sedî 74ê Kûrdêñ nasnameya wan bîhêz e dibêjin ew rûbirûyî cudakariyê dibin.

Ji besdaran hat pirsîn:

"Hûn ji ber nasnameya xwe ya Kurdbûnê rûbirûyî cudakariyê tên?"

Ji sedan 54ê Kurdish got "Erê" û ji sedan 42yê wan jî got "Na".

Li aliye din, ji çaran yekê Kurdish difikirin ku "Nêzîkbûna dewletê ya bi Tirkan û Kurdish re wekî hev e."

Bîrbiriya Tirkan a li Ser Kurdish

Li gorî beşa lêkolînen ya bi sernavê "Bîrbiriya Tirkan a li Ser Kurdish", hinek nêzîkbûnê nû li pozîsyonê wekî "Baz û Kevok" hatine zêdekirin.

Ev kategorî û rîjeyen wan bi vî rengî têna dabeşkirin:

Şehbaz (Şahînler) : Tiştekî bi navê "Kurd" nîne (ji sedî 14)

Başok (Atmacalar):

Kesên bi eslê xwe Kurd



hene lê em hemû Tirk in (ji sedî 19)

Baz (Doganlar): Kurd hene, pirsgirêka Kurdish çêbûye, ji ber kêmâsiyên pêşveçûnê ne, îro kêm bûye (ji sedî 32)

Qumruk (Kumrular): Pirsa Kurd heye lê di nava gelan de pirsgirêk nîne, eger siyaset têkil nebe dê çareser bibe (ji sedî 21)

Kevok (Guvercînler): Divê mafê Kurdish hebe, pirsgirêka Kurdish heye, daxwazê wan meşrû ne (ji sedî 12)

Qaqlîbaz (Martilar): Kurdish hene, mexdûr in, pirsgirêka Kurdish heye, daxwazê wan meşrû ne (ji sedî 2)

Herwiha hinek Tirk ji dibêjin:

"Hene, gelekî dişibin me,

dostêne me yêne kevin in, ewladêne vê axê ne"

"Rewşa wan ber bi başiyê ve çû, paş ve hatine hiştin lê niha ne wekî berê ne"

"Pirsa Kurdish nayê înkarkirin lê tê mezinkirin"

"Çareserî pêşveçûn û perwerde ye"

"Bila Kurdbûna xwe nexin nava çavêne me, bila ji bîr nekin ku zarokên vî welatîne."

Herwiha ji Tirkan hat pirsîn: "Gelo Kurdish rûbirûyî cudakariyê dibin?"

Li gorî wê, ji sedî 42yê Tirkan got "Erê" û ji sedan 26ê wan jî got "Cudakarî nîne."

Li aliye din, ji sedî 42yê Tirkan İş hemberî Kurdish xweşbîn in.

Babacan xwedî li zimanê Kurdî derket

Serokê Giştî yê partiya DEVA Alî Babacan bertek nîşanî neyartiya li dijî zimanê



Kurdî da û got: Li welêt zimanê duyemîn yê herî zêde tê axavtin Kurdî ye.

Serokê Giştî yê partiya DEVA Alî Babacan, di civîna çapemeniyê de li Meclîsê rojey nîrxand. Alî Babacan bi bîr xist ku di dema nîqaşen butçeyê yên li Lijneya Giştî ya Meclîsê de ji ber ku hin wekî bi Kurdî axivîn hin nîqaş hatin kiran.

Babacan amaje bi wê yekê kir ku zimanê Kurdî duyemîn ziman e ku li Tirkîyê herî zêde tê axavtin lê li meclîsê qedexe li ser tê danîn, di protokolê de wek "X" an jî "zimanê nenas" tê nîvîsandin û got:

"Yên ku Fransî û Îngîlîzî dizanîn, nîzanîn zimanê ku ji alî bi milyonan hemwelatiyê me ve tê axavtin kîjan e. Me li deqeyen herî dawî mîze kir, sê xal danîn binê wê û gotin 'gotinên ne Tirkî hatin gotin'. Navê lê bikin. Ger Hûn nav lê nekin, hûn nikarin li vî welatî behsa hemwelatîbûna wekhev û qala mafê bingehîn bikin".

Babacan herweha got: "Armanca me ya demokrasiyê ew e ku her kes ji kî be, ji kîjan taxê û ji kîjan nîrînê be, hemwelatiyê wekhev û birûmet ê vî welatî be".

Şêx Abdûlselam Barzanî û Dewleta Kurdistanê û Otonomî û Dewleta Federe ya Kurdistanê...



İbrahim GUÇLU

Şêx Abdûlselam Barzanî, li Kurdistanê serokekî neteweyî yê dîrokî û bi navûdeng û gelek girîng e. Ew şaxsîyet û serokekî gelek balkêş û rewşenbîr û mut-effekîr e. Ew di heman dem de serokekî arîstokrat yê oldar û serokê Nakşîbendîyan bû.

Serokatîya Şêx Abdûlselam Barzanî, ji serokatîya edetî cûdatir bûye. Xwedîyê qarek-tereke milî, civakî, olî û reformxwaz bûye. Loma jî Şêx Abdûlselam li herêma xwe gelek reformên dîrokî û girîng pêk tîne. Reformên di dema wî de pêk hatine, her Kurdekin jî baş dizane û jê re rêtigrin, ev in:

1-Xwedîyê mulkbûnê ji holê radike.

2- Axê li gûndîyan belav dike.

3-Qelindê bûkê ji holê radike. Bi zorê zewacê qedexe dike.

4- Pêwendîyên civakî û herêmî û însanî, gor pîvanêne wekhevî û edaletê rîdixê.

5-Biryar dide ku li her gun-dekî mescidek ava bibe. Ew mescîdan bes wezîfeya ol û îbadetê nebînin.. Di hamen dem de bibin navendêne civakî, navendêne danûstandinê, navendêne çareserkirina pirs-girêkan,

6-Li her gundekî ji bona ku pirsigirêk ji her aliyî ve çareser bibin, bi îradeya gûndîyan meclîsek/konseyek ava dike.

7-Ji her eşîretekê ji bona hêzîn çekdar ava bibe, biryar dide û gor wê biryarê hewil dide.

Şêx Abdûlselam bi van reformên xwe, bi hemû eşîretên Kurdistanê re dibe xwedîyê peywendîyek xûrt. Hemû eşîret jî bawerîya xwe ji Şêx Abdûlselam Barzanî re nîşan didin.

Ew di heman dem de xwedîyê projeyeke civakî û milî ye jî. Ew dixwaze ku pêşî li herêma xwe û pişt re jî li tevayî Kurdistanê vê sîstemê ava bike.

Ev sîstema jî, ji sîstema Împaratorîya Osmanî cûda û serbixwe ye. Ne sîsteme despotîk û otorîter e. Ew projeya wî, domandina projeya Şêx Übeydullah Nehrî ya milî ye.

Bi van projeyê wî, li Kurdistanê fîkrîn reformxwazî û civakî û milî belav bûn, rî û rîbazekek nû ava dibû.

Şêx Abdûlselam Barzanî, di sala 1907-an de bi hemû şêx

serok eşîrên Kurdistanê re civînekê li dar dixe. Di wê civînê de biryaren gelek girîng tên girtin. Ew biryaran pêşkêşî desthilatdarîya Împaratorîya Osmanî dibin.

Ew biryaren dîrokî û girîng ev in:

1- Li Kurdistanê, divê zimanê kurdî bibe zimanê fermî.

2-Li Kurdistanê, perwerdayî divê bi zimanê kurdî bibe.

3-Qeymeqam, midurên navçeyan, xebatkarên din, divê ji Kurdan bêni diyar kirin. An jî kêmîtîn divê ew memûrên ku kurdî dizanî ji bona Kurdistanê bêni diyar kirin.

4- Divê di daghehan de biryar gorî hiqûqa İslâmî bêni dayin.

5-Divê bac bê girtin. Lê ev baca divê li Kurdistanê ji bona çêkirina rîyan, avakirina dibistanan bê bi kar anîn.

Şêx Abdûlselam Barzanî, ji bona ku ev projeyê xwe yê milî pêk bîne, bi Hemû Cemiyetîn Kurdistanê re pêwendî datîne. Di heman dem de, bi Şêx Mehmed Hafîd, Şêx Abdûlkadîr Nehrî, Axayê Şîkakan Simko û pêşengên civaka kurd yê din re jî danûstandin dike.

Dema ku ew daxwazê serok eşîr û şêxên Kurdistanê, digihîjin destê desthilatdariya Osmanî, ew daxwazan li dîjî dewleta Osmanî wek îsyân tên qebûl kirin. Împaratorîya Osmanî, leşkerên xwe dişîne ser Kurdistanê. Hezar mixabin ji derveyî Eşîreta Barzan, eşîretên din li berxwe nadîn. Mixabin beşek ji wan eşîran jî dibin hevalên dewletê. Wê demê Şêx Abdûlselam biryara şer dide. Eşîreta Barzan, bi mehan şer dike. Lê Şêx Abdûlselam Barzanî mecbûr dibe ku herêmî terk bike.

Şêx Abdûlselam dije herêma Suryanîyan. Suryanî, li Şêx Abdûlselam xwedî derdikevin û cî didin wî.

Lê hêzîn dewletê dikevin Kurdistanê û herêma Barzan, gûndan dişewitînîn, malên gel talan diken. Mêran dikûjin. Jin û zarokan dîl dîgrin. Wê demê Mele Mistefa Barzanî (Birayê Şêx Abdûlselam yê biçûk) 3 salî ye. Ew, bi dêya xwe ve dîl tên girtin û di zîndana Misûlê de tên girtin.

Besek çekdar jî vedikişîn çiyayênil. Li benda biryara Şêx Abdûlselam Barzanî dimînîn.

Şêx Abdûlselam, di sala 1908-an de vedigere Herêma Barzan. Hêzîn xwe yêん çekdar dîsa dicivîne ser hev, li hemberî hêzîn dewleta Osmanî dest bi şer dike. Di vî şerî de, hêzîn Dewleta Osmanî zerarîn mezin dibînîn û şikest dixwin.

Şêx Abdûlselam Barzanî, li dîjî Meşrûtîyeta Yekemîn (1908) jî derdikeve. Ew li dîjî İttîhad

Terakkiyan jî xwedîyê helwest-eke reformxwaz e. Wan nîjâd-perest qebûl dike.

Piştî vê serkeftina Şêx Abdûlselam Barzanî, Hikûmeta Osmanî, ji Şêx Abdûlselam hevdîtinê daxwaz dike. Ew jî qebûl dike. Piştî muzekereyan, dewleta Osmanî daxwazan wî qebûl dike. Herdu teref girtiyan azad diken. Dewleta Osmanî, zerara daye herêmî tanzîm dike.

Lê dewleta Osmanî, bi soza xwe re girêdayî namîne, dest bi tade û zilmeka nedîti dike. Di sala 1913-an de biryar dide ku Şêx Abdûlselam Barzanî bê girtin. Loma jî hêzek çekdar dişîne ser wî.

Şêx Abdûlselam jî wê demê mecbûr dibe ku biçe Rojhelata

Abdûlselam Barzanî, di 14.12. 1914-an de, gorî nerînekê jî di destpêka sala 1915-an de tê idam kirin.

Şêx Abdûlselam Barzanî, li ber çavên malbata wî û birayê wî tê idam kirin. Wê demê Mele Mistefa Barzanî biryar dide ku tu wext teslimî dijminêni milete kurd nebe.

Bi idama Şêx Abdûlselam, milete kurd serokekî xwe yê mezin wenda dike.

Şêhîdketina Şêx Ebdûlselam Barzanî, dibe sedem ku di Şerê Cîhanî Yekemîn de neteweya kurd, wek neteweyê din derfet bi kar bînîn û dewleta Kurdistanê ava bikin.

Ittîhad Terakkiyên Osmanî, ji bona pêşîya pêvajoya dewle-

Barzanî ya neteweyî şopandin û meşandin. Ji bona ku neteweya kurd, mafê xwe yê neteweyî qezenç bike û li Kurdistanê statuyek serbixwe ava bibe û Kurd li welatê xwe desthilatdar bin, xebat û têkoşîneke bê hempa birêvebirin.

Dema ku Kurdistan bi Peymana Lozanê hat beş kirin. Wê demê Mele Mistefa Barzanî, li Beşû Başûrê Kurdistanê, ji Tevgera Neteweyî ya Kurdistanê re wê demê serokatî kir. Ji her tevger û serhildana neteweyî ya Başûrê Kurdistanê re piştgirî kir. Ji tevgerên neteweyî yên li Bakûrê Kurdistanê re bû piştgir. Dema di sala 1919an de, serhildana neteweyî dest pê kir, di sala 1925an de serhildanan dom kir, Mele Mistefa Barzanî û malbata Barzaniyan, ji van tevgerên neteweyî re bûn alîkar.

Dewleta Mehabad ya Kurdistanê, piştî Şerê Cîhanî yê Duyemîn, li ser mîrata Şêx Abdûlselam Barzanî ya statuparêz û reformxwaz şîn bû. Dewleta Kurdistanê, bû dewleteke reformxwaz û makezagoneke gelek demokrat pejirand. Mele Mistefa Barzanî bi pêşmergeyên xwe ve bûn alîkarê damezrandina Dewleta Mehabadê ya Kurdistanê û ket bin xizmeta Dewleta Kurdistanê. Ji Serokatîya Qazî Mihemed re rêt girt. Bi xwe jî bû serleskerê mezin yê Dewleta Mehabad ya Kurdistanê.

Dema ku Dewleta İranê, ji bona ku Dewleta Kurdistanê ji holê rake, êrîş kir, bi daxwaza Qazî Mihemed, Mele Mistefa Barzanî, bi hevalên xwe ve derbasî Yekîtiya Sovyetan bûn.

Piştî ku Mele Mistefa Barzanî û hevalên xwe, di sala 1958an de vegerîyan Iraqê û Kurdistanê, Şoreşa Neteweyî ya İlonê jî girêdayî şîura neteweyî û civakî ya Şêx Abdûlselam Barzanî dest pêkir û di sala 1970yî de bi avakirina Otonomiya Kurdistanê encada. Di sala 1974an de, li hemberî Dewleta Iraqê ya faşist û kolonyalîst, şerî jî bona Kerkukê jî bi şîura Şêx Abdûlselam Barzanî dest kir û domand.

Şoreşa Neteweyî ya Gulanê jî di sala 1976an de, di bin serokatîya Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî de, bi şîura neteweyî û bi projeya Şêx Abdûlselam Barzanî dest pê kir. Di gelek zehmetîyan re derbas bû. Di encamê de, ji bona avakirina Dewleta Federal ya Iraqê û Dewleta Federe ya Kurdistanê derfet çêkir.

Dewleta Federe ya Kurdistanê jî encama şîurê û projeya Şêx Abdûlselam Barzanî ye.

Divê hemû kurd li hemû beşan xwedîyê vê şîurê bin û bi vê şîurê tev bigerin.

Diyarbekir, 16. 12. 2021



Kurdistanê. Dibe mîvanê Seyîd Taha. Nêzikî Ürmiyeyê li Rajanê bi cîh dibe. Di salên 1983-an de jî Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî li vî bajarî xwedîyê bingehêkê bû.

Dewleta Osmaniyan, ji bona ku Şêx Abdûlselam Barzanî dîl bê girtin û an jî bê kuştin, xelatek mezin pêşkêş dike.

Şêx Abdûlselam Barzanî, di vê qonaxê de, bi Axayê Şîkakan Simko re hevdîtinê dike. Bi hev re derbasî Gurcistanê, bajarî Tiflisê dibin. Bi berpirsiyaren Çar re danûstandin diken. Lewra Çar soz dabûye ku di têkoşîna milî ya Kurdan de bibe alîkar.

